Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1013 | 13-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Ji ber nebûna sotemeniyê daristanên Balekayetî tên birîn

**Li Balekayetî ji ber buhabuna sotemenî û nebûna sotemeniya pêwîst, salane gelek welatî diçin daran dibirin û li şûna neftê bikartînin. Îsal jî welatiyan li daristanên xwezayî yên deverê gelek darên ter birîne. Birîna daran jîngehparêzên deverê xistiye nava fikaran. Jîngehparêz daxwaz ji hikûmetê dikin ku li beramberî rewşa heyî helwest nîşandin.**

Devera Balekayetî deverek çiyayî û sare, Zivistan li vê deverê li gor deverên din ên Herêma Kurdistanê dirêjtire. Ji ber hikûmet bi qasî pêwîst neft û elektrîk nade welatiyan û nirxê neftê jî girane,





welatî jî gelek caran li şûna neftê daran bikartînin. Birîna daran jî ziyanek mezin bi jîngeha deverê digihîne.

Derbarê mijarê de welatî û jîngehparêzên deverê ji Rojnews re axivîn.

daran dibirin û ziyanek mezin bi jîngeha deverê digihe.

Çalakvanê Jîngehê Bextiyar Behcet jî derbarê metirsiya buhabûna sotemenî û dar birînê de got: "Ji ber îsal li gor salên borî nirxê neftê zêde bûye û bûye nêzî 200 dolar, welatî serî li dar birînê didin. Li piraniya deverên çiyayî dar tên birîn û ev yek jî bandorek nerênî li ser jîngeha deverê dike."

Bextiyar got: "Salên borî ger neft giranbûya jî welatiyan ji bo xwe germkirinê gaz (Tûp) bikardianîn. Lê îsal gaz jî giran bûye û hatiye sinordarkirin. Wisan lê hatiye ku divê her malek mehê klîneyek yê gazê bistîne. Vê rewşê wisan kiriye ku welatî hîn zêdetir daran bibirin. Ji bona wê divê hikûmet hîn zêdetir sotemeniyê bi ser xelkê deverê de belav bike. Ji berku ev dever ji hemû deverên din zêdetir



Welatiyê bi navê Nîhad Hemedemîn da zanîn ku salane welatiyên devera Balekayetî rastî heman pirsgirêkan tên. Nîhad got: "Ev pirsgirêk jî nebûna sotemenî û giraniya nirxê sotemeniyê ye ku dibe sedem beşek ji welatiyan herin daran bibirin û xwe li ber germ bikin."

Nîhad diyar kir ku devera Balekayetî li gor deverên din ên Herêma Kurdistan û Iraqê deverek sartire û wiha domand: "Hîn ji destpêka demsala Peyîzê ve befir û baran li deverê dibare û pileyên germahiyê bi rêjeyek zêde dadikeve. Ji bona wê li Balekayetî pêwîstiya her malbatekê bi heft bermîlên sotemeniyê heye."

Her wiha Nîhad da zanîn ji ber hikûmet neft, gaz û elektrîkê bi qasî pêwîst nade wan yan jî erzan nake, welatî jî diçin pêwîstiya wan bi sotemeniyê çêdibe."

Çalakvanê Jîngehê Bextiyar Behcet destnîşan kir ku îsal li gor salên din zêdetir dar hatine birîn û gelek kesên daran dibirin jî bazirganiyê pê dikin û daran ji bo firotinê dişînin bajar û navçeyên din.

Balekayetî deverek çiyayî ye, çiyayên herî bilind ên Herêma Kurdistan û Iraqê dikevin vê deverê. Ji ber wê salane befir û baranek zêde li deverê dibare û Zivistana wê demdirêje. Zêdetirî 45 hezar donim zevî daristanên wê yên xwezayî heye. Salane ji ber nebûna sotemenî û elektrîkê gelek dar lê tên birîn. Hikûmet û aliyên peywendîdar jî di beramberî rewşê de bêdengin.-

***ROJNEWS***

# Ne ji bo melikekî ji bo malekê

Nivîsa mîxî jî gava derket, ji bo hesabên besît ên bazirganiyê û inventarên dexl û dan hatibû bikaranîn. Paşê ji bo mîtolojiyê û seferên leşkerî. Niha jî em dizanin ku hevoka em pê dizanin a pêşî ya bi alfabeyekê hatiye nivîsandin jî elaqeya xwe bi melik û desthilatê nebûye. Ev hevok, li ser şeyekî ji bo paqijkirina porê ji rişk û spiyan hatiye nivîsandin. Ev şeyê ji diranê fîlan jî di goreke ji serdema bronzê ya li welatê Kenaniyan de hatiye dîtin. Jixwe, zimanê hevokê jî Kenanî ye. Û ev şê li gorî testa karbonê 3 hezar û 700 salî ye; yanî ji beriya mîladê hezar û 700 salan maye.

Cihê ku gor lê Laçîş e. Li nav erdên Îsraîla îro ye. Hevoka em behsa wê dikin jî tenê heft peyv in. Ne pesnê melikan û desthilatan dide, ne jî behsa ezameta seferên leşkerî dike. Hevok dibêje, "Xwedê bike ev şe spiyan ji por û rihê biqelîne".

Ev alfabeya Kenanî ku fenîkiyan wê paşê ji bo bazirganiyê bi kar bianiya, çavkaniya alfabeyên Erebî, Latînî û Krîlî ye jî.

Nivîsên bi Kenanî yên bi vê alfabeyê nivîsandî yên kevintir jî hene; li ser dîzikan û li ser serê tîran peyvek carinan du peyvên nivîsandî hebûne. Lê ev hevoka li ser vî şeyî, hevoka yekem a tê zanîn a bi alfabeyekê nivîsandî ye. Lê ew ne kîtabeyeke melikekî ye, tiştekî insanî ye. Mirov îro roj bi xwe jî dikare ji hal û ehwalê ev hevok dayî nivîsandin fêhm bike.

**Xwedê bike ev şe spiyan ji por û rihê biqelîne**

Nivîs beriya wê hatibû bipêşxistin. Sumeran bi kiteyan û nîşanên ji bo peyvan, nivîsa xwe bi pêş xistibû. Lê bi qasî ku heta îro em pê dizanin, alfabeya Kenaniyan, alfabeya herî kevin e mirovahiyê ye. Ev alfabe paşê bi rêya Fenîkeyiyan li dinyayê belav bû



û bingehê alfabeyên Yewnan û Latînî û yên Erebî, Aramî jî pêk anîn.

Axir bi 17 herfan 7 peyvên ku dibêjin, "Xwedê bike ev şe spiyan ji por û rihê biqelîne" hevoka pêşî ya tê zanîn e ya ku bi alfabeyekê hatiye nivîsandin. Ev şe şeyekî pirr piçûk bûye, berê wê tenê 3,5 santîmetre bûn û dirêjahiya wê jî 2,5 santîmetre. Kî dizane, belkî hingê jî eyb bû ku mirov li xwe mikur bên spiyan girtiye por û riha mirovî û ji ber wê ev şeyê piçûçik di berîkeke xwe de digerandin.-

***Ozgurpolîtîka***

Sudoku:Pirs 23

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | 5 | | | | |
| | | 8 | 9 | | | | 5 | 1 |
| | 9 | | 8 | 1 | | 3 | 4 | |
| | | 9 | | | 7 | 8 | | 4 |
| | | | | | | | | |
| 7 | | 5 | 6 | | | 9 | | |
| | 8 | 3 | | 7 | 6 | | 9 | |
| 2 | 6 | | | | 5 | 1 | | |
| | | | | 3 | | | | 6 |

Sudoku: Bersiv 22

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 4 | 7 | 2 | 6 | 8 | 1 | 5 | 3 |
| 8 | 1 | 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 2 | 9 |
| 2 | 6 | 3 | 9 | 5 | 1 | 4 | 8 | 7 |
| 1 | 3 | 2 | 7 | 8 | 4 | 5 | 9 | 6 |
| 6 | 5 | 4 | 3 | 9 | 2 | 8 | 7 | 1 |
| 7 | 8 | 9 | 6 | 1 | 5 | 2 | 3 | 4 |
| 3 | 9 | 1 | 5 | 2 | 6 | 7 | 4 | 8 |
| 5 | 7 | 8 | 1 | 4 | 3 | 9 | 6 | 2 |
| 4 | 2 | 6 | 8 | 7 | 9 | 3 | 1 | 5 |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bender | Kêştîgeh, lîman. Berava kêştî lê radiwestin. |
| Biha/bihakirin | 1. Bazarkirin: Min solek ji xwe re biha kir, lê min nekirî.<br>2. Nirx, qîmet: Bihayê vê solê çiqas e?<br>3. Giran, zêde: Îsal goşt pir biha ye. |
| Dagîrkirin | Vegirtin: Gundê me dagîr kirin. |
| Danezan | Daxuyanî, beyanname: Di danezanê de gelek bend hene. |
| Derfet | Delîve, imkan. |
| Dersînorkirin | Derxistina kesekî derveyî sînorê welatekî. Almanya gelek koçber dersînor kirin. |
| Jenosîd (Fransî) | Qirkirin, tevkujî, gelkujî. |
| Parze | Dermanê ji bo pêşîgirtina li nexweşiyekê: Ji bo parastina ji nexweşiya sorikê zarok hatin parzekirin. |
| Işkence (Farisî) | Madî yan jî manewî eziyeta zêde: Girtî hatine işkencekirin. |
| Trajedî (Fransî) | Êşa pir mezin. Karesat, felaket. |



# YJA Star: Em ê armanca her sê Şehîdan bi cih bînin

YJA Star salvegera şehadeta fermandar Peyman Bagok, Agirî Gabar û Çavrê Amed bi minetdarî bi bîr anî û got, soza me ewe ku em ê armanca hevalên xwe yên şehîd bi cih bînin.***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1013 | 13-Mijdar- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# GEL LI DIJÎ ÊRÎŞÊN KÎMYAWÎ Û XIYANETÊ LI SER PIYAN E

Li hemberî êrişên Kîmyawî yên dewleta Tirk ya dagirker yên li dijî Herêmên Parastina Medya û xiyaneta PDK`ê, çalakî û bertekên gelên herêmê bênavber dewam dikin. Gel bi biriyardarî daket qadan û piştgiriya xwe ya ji Gerîlayên azadiyê re ragehand.



## Bernameya çalakiyên 25`ê Mijdarê hat raghandin



Di bin dirûşma "Li hemberî her cure tundiya dewlet û zihniyeta mêr… Jin, Jiyan, Azadî" de Platforma çalakiyên hevpar yên tevger û rêxistinên jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyaniyek da û tê de bernameya çalakiyên xwe yê ji bo 25`ê Mijdarê ragihand. ***R-3***

## Şewata Sînemaya Amûdê bûyer û dîrokeke bi êş e



62 sal di ser şewata Sînamaya Amûdê re de derbas dibin hê jî hurgiliyên bûyerê di hişê şahid û welatiyên bajêr de ye. Mihemed Emîn Ebduselam ku ew jî di komkujiyê de hazir bû got, hê jî êşa wê rojê weke roja îro di dilê me de ye, lewra nifşek ji paşroja Amûdê hat tinekirin. ***R-6***

## Pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î` encameke baş da jinan





Rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa Tenduristiyê Melîka Hesaf da zanîn ku pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î` ya ku di destpêka heyva Cotmehê de dabûn destpêkirin encameke baş da jinan û got, Jimareke baş ji jinan tevlî pêngavê bûn. ***R-2***


Duh Helebçe Îro jî Avaşîn
FARÛK SAKIK *R-4*


Mezinên Xwe Nîn Bin….
Idrîs Henan *R-5*

# Pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î` encameke baş da jinan

Rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa Tenduristiyê Melîka Hesaf da zanîn ku pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î` ya ku di destpêka heyva Cotmehê de dabûn destpêkirin encameke baş da jinan û got, Jimareke baş ji jinan tevlî pêngavê bûn.

**Darîn Silê/Qamişlo**



Di dema dawî de li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê penceşêra sîngê zêde bûye. Heta niha nêzî 15% jin bi nexweşiya penceşêra sîngê ketine. Gelek jin jî hene pê dikevin, lê ji ber ku li xwe napirsin pê dernaxin ku nexweşî giran dibe. Gelek jê jî newêrin li xwe bipirsin, lewra ji nexweşiyê ditirsin. Ev jî dibe sedema ku nexweşî li wan girantir bibe û bi awayekî zû jê rehet nabin. Ji bo wê jî divê her dem jin li xwe bipirsin û tenduristiiya xwe paşguh nekin. Lewra çiqas mirov nexweşiya xwe paşguh bike, ewqas çareseriya wê nexweşiyê zehmet dibe.

Ji bo hişyarkirina jinan li ser nexweşiya penceşêra sîngê, Komîteya Tenduristiyê ya Weqfa Jina Azad ya Sûriyê 1`ê heyva Cotmehê li bajar û gundewarên kantona Qamişlo dest bi pêngava `Tu Ji Penceşêrê Bi Hêztir î` kirbû. Herwiha tê payîn ku her sal di destpêka heyva Cotmehê de weqf bi vê pêngavê radibe. Lewra ev heyv bi heyva penceşêra sîngê an jî bi heyva gulîn tê nasîn. Pêngav zêdetirî heyvekê dewam kir û di 8`ê vê heyvê de bi dawî bû. Di pêngavê de semînerên hişyarkirinê ji gelek jinên bajar û gundewarên Qamişlo re hat dayîn.

Derbarê bidawîkirina pêngavê û hişyariyên li ser nexweşiya penceşêra sîngê, herwiha encamên ku pêngavê bi dest xistîn, rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa Tenduristiyê Melîka Hesaf ji me re axivî û da zanîn ku pêngav 19 navenên cûda yên jinan hedef girt.

**`Armanc hişyarkirina jina ye`**

Melîka Hesaf got, armanca me ji pêngavê ew e bû ku em tevayiya jinan li ser nexweşiya Penceşêra sîngê hişyar bikin û axaftina xwe wiha domand: "Her sal em bi pêngavên wisa radibin. Armanca me ji pêngavê ew e ku tevayiya jinên me nexweşiya penceşêra sîngê nas bikin û jê hişyarbin.

**`Pêngavên bi vî rengî ji bo jinan pir bi sûdin`**

Melîka destnîşan kir ku di pêngavê de gelek semînerên li ser sedem û nîşanên nexwşiyê, bi taybet hişyariyên li ser nexweşiyê ji jinan re hatin dayîn û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Pêngavên bi vî rengî ji bo jinan pir bi sûdin, da ku jin karibin parastina xwe bikin û ha ji tenduristiya xwe hebin. Herwiha di pêngavê de jinên ku nexweşiya penceşêrê bi wan re heye, me hewl da derûniya wan geş bikin û hêz bidin wan, da ku nexweşî ji wan re nebe astengî û jiyana xwe bi xweşî derbas bikin."

**`Jimareke baş ji jinan tevlî pêngavê bûn`**

Malîka di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku di pêngavê de gelek jin beşdar bûn û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tevlîbûneke mezin ya jinan ji pêngavê re hebû. Herwiha got, di her semînerekê de nêzî 20 jin tevlî dibûn. Jimara jinên ku tevlî pêngavê bûn bi giştî 193 jin bûn."

**`Pêngav encameke baş da jinan`**

Melîka da zanîn ku pêngav encameke baş da jinan û wiha pê da çû: "Jinên




ku tevlî pêngavê bûn kêfxweşiya xwe dan xuyakirin, diyar bû ku pêngav emcamên baş daye wan. Herwiha pêngav di nav civakê de jî deng veda. Gelek jin dema ku dibihîstin têkîliyên xwe bi me re çêdikirin."

**Emê her demê pêngavên hişyarkirinê bidin çêkirin**

Rêvebera Weqfa Jina Azad ya beşa Tenduristiyê Malîka Hesaf di dawiya axaftina xwe de got, em bihêvîne ku di demên pêş de em bighêjin armanca pêngava xwe, da em ji tevayiya jinan re bibin alîkar. Herwiha ne di heyva Cotmehê tenê, emê her demê pêngavên hişyarkirinê bidin çêkirin. Da ku civak jî tendutistiya xwe paşguh neke.

# `Dengê jinên Kurd weke destaneke resen e`

**Jinên koçer ên ku stranên resen û kevin dibêjin diyar dikin ku ji Şahmerana sembol a ku destaneke dîrokî ye ji bo jinên stranbêj, ew ê dengê xwe yê zîz bigihînin tevahî cîhanê û kevneşopiyên xwe biparêzin.**

Stranbêjiya Kurdî ji aliyê xwezaya ku tê de ji dayik bûye, ji çiya û deştan, cuda bûye. Ji ber vê yekê, stranbêjiya Kurdî ket bin bandora xwezaya xweşik û dîmenê bedew ku li ser wê stran digotin û bersiva reseniya wê ya taybet da. Li Rojavayê Kurdistanê jî mirov nikare behsa stranbêjiya resen bike bêyî ku stranbêjên Kurd ên jin bîne ser ziman. Bi taybetî jinên koçer ên li bajarê Dêrikê - Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku bi dengê xwe yê bilind û zîz tên nasîn, heta roja îro kilam û stranên xwe yên resen ji bîr nekirine. Têkildarî vê mijarê, du jinên koçer ên bi temenê xwe mezin ji bajarê Dêrikê ne, ji ajansa me re behsa stranbêjiya resen kirin û hin kilamên resen bi hev re gotin.

Şopdarên stranbêjiya Kurdî taybetmendiya xwe di 'meyanatê' de ango bilindbûna tebeqeya dengê stranbêj de dibînin ku jê re tê gotin 'bandorbûn û bandorkirin' ew di vê strabêjiyê de di navbera bajar û bajarekî din de taybetmendiyê dibînin. Em ji vê yekê encam didin ku her rengê stranbêjiyê ji hawirdora xwe ya tê de ji xwezayê û rewşên din çêdibe, bandor dike. Her wiha stranên Kurdî gelek celeb in û gelek şêweyên performansê ne. Di nav wan celeban de stranên gund jî hene, di nav wan de stranên xweş ên bi dîlana gelêrî ya Kurdî ya pir-rengî tên pêşkêşkirin. Hin ji wan awaz û axaftinên kevn in, hin ji wan jî pergalên nûjen in ku li her çar hêlên Kurdistanê dewlemend û rengîn in.

**`Her stranek ji bo me destan e`**

Sûad Mustefa ya koçer ji bajarê Dêrikê-Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di destpêka axaftina xwe de qala stranbêjiya resen a Kurdî, demên wê ya gotinê, mijarên ku stran li ser tên gotin dike û wiha wiha tîne ziman; "Stran li ser gelek tiştan tên gotin wekî darê lendanê, şînî, cotkar, palehî, destar û gelek mijarên din ên cuda. Em dikarin vê bibêjin ku di xweşî û nexweşiyê de stran tên gotin li gorî bûyerên jiyanî yên ku diqewimin, hem mirov ji kêfê re û hem jî ji meraqa zêde dibe dengbêj. Di dema berê de, dema ku şer di navbera du eşîran de çêdibû, aliyê ku di wî şerî de bi ser diket stranên kêfxweşiyê digotin li ser eşîra xwe û pesnê wê didan. Her wiha aliyê ku bi bin diket di wî şerî de stranên xemgîniyê digotin. Mînaka wê jî strana kevin a ku tê de tê gotin, "Mêrxasên mala bavê min nemane, ji lewma çeper li pêşiya mala bavê min şikandin." Zimanê Kurdî di cewherê xwe de pir dewlemend de, lewre çi gotinek ji devê mirov derdikeve, dibe stran û destaneke pîroz ku tê nivîsandin."

**`Piraniya stranên me yên Kurdî li ser keda jinan hatine gotin`**

Sûad Mustefa bal kişand ser stranên Kurdî yên piraniya wan li ser jinan hatine gotin da ku keda wan bide xuyakirin û wiha pê de çû; "Ji dîrokê ve, piraniya stranên me yên Kurdî li ser jinan hatine gotin, bêguman her stranek armancek ji gotina wê heye û mînaka wê jî strana Şahmaran e ku li ser jinan tê gotin. Bi gotina van stranan dîroka jinan tê vegerandin, keda wan tê xuyakirin, armancên wê jî tên diyarkirin û ji xwe heta roja îro jî ya ku ked dide di hemû hêlên jiyanê de jin e."

**`Nehêlin ku dîroka me ya stranbêjiyê winda bibe`**

Sûad Mustefa bang li civakê kir ku nehêlin dîroka wan a stranbêjiyê winda bibe û wiha bi dawî kir; "Wekî ku dayik, bavên me stranên resen ji me re digotin û di bîra me de maye, em dibêjin bila zarokên me yên pêşerojê jî fêr bibin û nehêlin ku werin helandin. Bila civaka me nehêlê çanda me bê windakirin, ji ber ku ev nasnameya me ye. Em ji destpêkê ve bi cil û berg, kevneşopî, deng û stranên xwe hatine xuyakirin, bila her dem em di nav cîhanê de wekî Kurd xuya bin û dev ji çanda xwe bernedin."

`Jinên koçer bi stranên xwe yên li palehiyê gelek navdar in`

Her wiha Fatima Sedûn ji bajarê Dêrikê ye behsa navdariya jinên koçer di stranbêjiyê, stranên herî navdar ên kevin de wiha dike; "Stranên resen ên kevin û herî navdar di dema



berê de û heta roja îro stranên li ber palehiyê ne, dema ku kurmanc diçûn palehî, di nav bênderan de, di ber re stran û kilam digotin heta ku karê xwe diqedandin. Aliyên herî navdar jî di dengbêjiya resen de li Rojavayê Kurdistanê koçer in. Strana herî zêde li ber dilê min şêrîn e û bandorê li min dike ji zaroktiyê û heta vê temenê ku ez gihîştimê strana Şahmaran e, li ser jinan tê gotin dema ku di nav erd de dasikê xwe diavêjin û dibêjin 'Şahmaranê û mala bavê, Şahamaranê, bejn bilindê û rû nîşanê. Me cot kişand ji behra Wanê.'"

Fatima Sedûn herî dawî got, "Her dawî jî hêviya min ew e ku civaka me stranên xwe ji bîr neke, bila nebêjin em şerm dikin û dengê xwe dernaxin." ***JîNHA***



# Hewraman; Welatê Keviran

Wênegir Husamettîn Bahçe piştî projeyên xwe yên "Koçer", "Êzîdî", "Sûryaniyên Turabdînê" û "Mazxana" vê carê bi projeya xwe ya "Hewraman" daye pey civakeke îzolekirî û di çarçoveya vê projeyê de gelek fotografên belgeyî girtine kitêba "Hewraman" jî encama wê ye.

Husamettîn Bahçe weke wênegirekî Kurd ji gotina "Tu yê li gencîneya xwe li wî cihî bigerî yê ku te ew lê winda kiriye…" feyz digire û projeyeke bi navê "Hewraman" ku ji gelek fotografên belgeyî pêk tê, biriye serî. Husamettîn Bahçe motivasyona xwe ya ji bo vê projeyê, wiha tîne ziman: "Min jî hêz ji van gotinan girt û min dît ku ez li ser jiyana sosyo-kulturî ya Hewramana ku pişta xwe spartiye Zagrosan, hevpeyvînê dikim. Kurt û kurmancî, ew çiya û mirovên li wan çiyayan dijîn, sedema çêkirina min ya vê projeyê ne."

Husammettîn Bahçe wênegirekî ji Diyarbekirê ye. Weke endamekî "Kolektîfa NarPhotos a Fotografan" bêhtir bala wî li ser fotografên belgeyî ye û ew nexasim di vî warî de dixebite. Pêşangeha wî ya yekem bi navê "Koçer" derbarê koçeran de bû. Wî wêneyên gelek koçeran li zozanan girtibû û ev wêneyên xwe sala 2003'yan di pêşangehê de nîşanî xelkê dabûn. Piştî vê pêşangeha xwe, ew çû Başûrê Kurdistanê û vê carê da pey şopa Êzîdiyan û sala 2006'an jî pêşangeha bi navê "Êzîdî" vekir. Piştî vê xebata xwe wî dixwest behsa Sûryaniyên Turabdînê bike. Ji lewma, sala 2008'an jî pêşangeha bi navê "Sûryaniyên Turabdînê" vekir. Her wiha wî sala 2011'an jî jiyanên rojane yên li Amedê kire mijara kadraja xwe û bi navê "Mazxana" pêşangeheke din jî vekir. Ev xebata wî di heman demê de weke pirtûk jî hat çapkirin.



Xebata wî ya bi navê "Li welatê keviran; Hewraman" ya dawî ye. Piştî ku ew çend car çû serdana Hewramanê, pê re arşîveke baş çebûye û wî ev arşîva fotografan di pirtûka "Hewraman" de kom kir û ev pirtûk ji Weşanên Wêjegeh derçû.

**Civakên îzolebûyî dike belge û nîşan dide**


Husamettîn Bahçe projeya xwe ya dawî ya bi navê "Hewraman" jî weke dewama projeyên xwe yên din dibîne û taybetmendiyeke hevpar nîşan dike di nava van xebatên xwe de. Bahçe ji bo coğrafya Hewramanê dibêje, ew li derveyî dinyayê hatiye hiştin û wekî encama vê yekê jî wan nirxên xwe yên çandî parastine û ev yek bûye hîm û sedem ku ew derbarê Hewramanê de projeyeke dûr û dirêj çêke. Ew projeya xwe wiha dinirxîne: "Taybetiya hevpar a ku ev serpêhatî bi hev ve gire dan jî ev bû; civakên navbirî bi awayekî, beşekî wan hatibûn îzolekirin û ji ber îzalasyonê, her sê civakan jî xwe û kakila xwe parastibûn û li ser reh û bingehê xwe mabûn; û her sê projeyan jî, li ser çarçoveya têgehên parastina kakilê xwe û xwegirêdana bi rehên xwe ve, ev civak li xwe kiribûn mijar."

**Oromon yan jî Welatê Medan**

Bahçe di pirtûka xwe ya "Hewraman" de li gel fotografên xwe, gotarek jî belav kiriye û ew di vê gotarê de behsa dîroka Hewramanê û serpêhatiya xwe ya vê projeyê dike. Li gorî agahiyên Bahçe, navê Hewramanê di dîrokê de bi gelek awayên cihê hatiye hildan û navên ji bo Hewramanê tên hilanîn jî bêhtir îşaret bi erdnîgariya Hewramanê ya asê dikin. Weke, Welatê Rojê, Welatê Keviran, Warê Pak û Pîroz, Welatê Medan… Jixwe, peyva "Oromon" bi zimanê Asûriyan e jî tê maneya "Welatê Medan" û navê Hewramana niha ji vê peyvê peyda bûye. Lê Bahçe navê "Welatê Keviran" kiriye sernavê gotara xwe û bi vî awayî behsa Welatê Keviran, Hewramanê kiriye. Belê, ew Hewramana ku Skender gotibû, "Min li wan çiyayan nîvê artêşa xwe winda kir!"

**Ji bo projeyê hînî Hewramî dibe**

Bahçe di gotara xwe de dibêje, Hewraman di navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê de di hembêza çiyayên Zagrosan de ye û Hewramanê weke sê beşan



dabeş dike; Hewramana Text, Hewramana Lihon û Hewramana Jawero. Geştûgera Bahçe ya demkurt û ya yekem di rojên dawî yên sala 2018'an de pêk tê. Ew destpêkê diçe serdana Hewramana Text lê serdana wî ya ewilî bi reşbînî bi dawî dibe. Bahçe vê rewşê wiha rave dike, "Yek ji gelemşeyên herî giring ew bû ku min li ser vê şêwezarê bi peyvekê jî nizanîbû. Lê kanalên televiziyonê yên ku weşana xwe bi Kurdî dikirin, bûbûn sedem ku gelek kesên li Hewramanê dijiyan hindik be jî, hinî şêwezarên Kurmancî û Soranî bibin. Vê yekê, hindik be jî, hêsanî bo me çêkir da ku em karibin bi hev re bidin û bistînin. Min jî dest pê kir, peyvên ku bi Hewramî hîn dibûm, di deftera xwe de binivîsîm." Bahçe piştî vê serdana xwe ya ewilî, berê xwe dide Hewramana Jawero ku gundên bi navê Palangan, Tengîser û Avheng jî lê bûne. Lê ew diyar dike ji bo projeya xwe, herî zêde çûye Hewramana Text û gelek demsal li wir fotograf girtine.-

**Ozgurpolitika**

# Ji ber hikumetê alîkarî jê qutkir, Komeleya Hunerî piştî 55 salan hatiye girtin

**Piştî 55 salan deriyê Komeleya Huner û Wêje ya Kurdî a li Rewandizê hatiye girtin. Hunermend dibêjin, hikumet girîngiyê nade hunerê û wisan biçe wê li Rewandizê huner ber bi tinebûnê biçe.**

Hunermend mamosta Zirar Rewandizî di sala 1977'an de Komeleya Hunerî ya bi navê 'Komeleya Huner û Wêjeya Kurdî ya li Rewandizê' damezrand. Karê sereke ya vê komeleyê lidarxistina karê hunerî û qeydkirina stranane. Herwiha di komeleyê de şêwekarî jî dihate fêrkirin. Demek dûr û dirêj komeleyê xizmeta hunera Rewandiz dike û bi dehan kes di komeleyê fêrî hunerê bûne.

Di çil salên borî de, bandora çalakiyên hûnerî yên komeleyê gelek diyar bûn. Lê niha komele tê girtin û hunera bajêr jî ber bi windabûnê diçe.

Niha deriyê komeleyê hatiye qulfkirin û demek dirêje hatiye girtin. Herwiha metirsiya rûxînê jî li ser dîwarê komeleyê heye, kel û pelên di nava komeleyê de bi salane nehatine bikaranîn. Endamê Desteya Rêveber ya Komeleya Huner û Wêjeya Kurdî ya li Rewandizê Piştîwan Cemal derbarê mijarê de ji Rojnews re axivî.

Piştîwan da zanîn ku piştî qeyrana 2014'an hikumetê alîkariya ji bo komeleyê qutkir, ev jî bandorek nerênî li ser çalakiyên hunerî yên komeleyê kir. Piştîwan destnîşankir ku pêwîst bû hikumetê alîkariyê ji komeleyê qutnekiriba, lê piştî hate birîn çalakiyên komeleyê jî rawestan û komele yekser qepat bû.

Piştîwan di dewamê de behsa karê komeleyê kir û wiha got; "Komeleya Huner û Wêje ya Kurdî a Rewandizê karê hunerê ji bo komên hunerî dikir û li her çar parçeyên Kurdistanê çalakiyên xwe pêktanî. Di salên 90'ê de bi dehan sirûdên netewî ji bo şoreşên Kurdan qeyd kir. Hunermend Nasir Rezazî û Necmedîn Xulamî jî li vê komeleyê stran û sirûdan qeyd kirin. Herwiha hunermend Ednan Kerîm di dema xwe de livir bi hunerê re xerîk bû. Ji ber çalakiyên komeleyê, li Rewandiz



hestên hunerê zindî bûn."

Hunermend Karmend Rewandiz ji bo vê hikumetê rexne kir û got; "Nabe êdî ev komele bi vî awayî bibe, pêwîste hikumet kar li ser vê bike û komele dest bi karê xwe bike. Ji ber ku ev komele xizmetek mezin ya hunerî a bajarê Rewandizê kiriye û nabe bi vî şêweyî muamele pêre were kirin. Komele weke peymangeha



Hunere Ciwanek ya Rewandizê bû, lê girtina wê ziyane. Ji ber ku komele malbendek taybet û girîng bû, li komeleyê kes heya digihiştin peymangehan dihatin perwerde kirin. Li peymangehan tenê ew kes dibûn kesek akademî. Lê bi girtina komeleyê re bandorek nerênî li ser peymangehê jî çêbû."

***- ROJNEWS***

# Peymangeha Şehîd Viyan Amara ji girtîgehê bû çavkaniya zanistê

Peymangeha Şehîd Viyan Amara li herêma Şehbayê bû wargeha xeyalên xwendekarên koçber, cihê ku di dema desthilatdariya hikumeta Şamê de girtîgeha zarokan bû, niha bûye jêdara zanist û wêjeyê

Zana Roj/ Şehba



Şoreşa Rojavayê kurdistanê ji bo tavahî gelê Kurd bû vejîna jiyaneke nû, bi avakirina sîstema rêveberiya xweser li herêma Efrînê zimanê dayîkê di tavahî dibistanan de hat xwendin, bi avakirina yekemîn zanîngeh li herêma Efrînê, paymangeha Şehîd Viyan Amara di sala 2014 an de hat avakirin, di tavahî sîstema zanîngeh û paymengehan de îdeolojiya netewa demokratîk esas hat girtin, bi destpêkirin şerê ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatiye kirin û derbasbûna gel ji herêma Şehbayê re, rûxmî tavahî şert û mercên koçberiyê, careke din bi îsrardarî û îradeyek mezin dest bi xwendin û perwerdeya bi zimanê dayîkê hat kirin.

Têkildarî vê yekê hevserokê Paymangehê Şehîd Viyan Amara Mihemed Osman û xwendekara bi navê Zîlan Sîdo ji rojnameya me re axivîn.

**`Peymangeha Şehîd Viyan Amara ji Efrîn derbasî Şehbayê bû`**

Mihemed Osman diyar kir ku bingeha peymangeha Şehîd Viyan Amara li Efrînê bû û wiha got: “ Peymangeha Şehîd Viyan Amara di sala 2014 an de li herêma Efrînê hat avakirin, 4 salan di Efrînê de hat berdewam kirin, piştî derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re, me nexwast ku xwendekar ji xwendinê dur bikevin, li ser wê bingehê di şert û mercên zehmet de Desteya Perwerdê xwe ji nû ve birêxistin kir û dest bi avakirina dibistanan kir”.

**Mihemed da xuyakirin ku ji ber** pêwîstiya wan bi mamosteyan hebû, lewra Viyan Amara ji nû ve hat avakirin û wiha domand: “Piştî bicihbûna gel li herêmê û vekirina dibistanan kêmbûn di hejmara mamosteyan de hebû, pêwîstiya me avakirina kadroyên mamosteyan çêbû, lewra di sala 2019 an de me Paymangeha Şehîd Viyan Amara ji nû ve da avakirin”.

**`Ji girtîgeha zarokan bû avahiya zanistê`**

Mihemd da zanîn ku avahiya ku niha Paymangehe, di dema desthiltdariya hikumeta Şamê de girtîgeh bû û wiha got: “Cihê ku hatiye hilbijartin ji bo bibe paymangeh cihekî pir cuda û wetedar e, di demên ku hikiumeta Şamê li ser Şehba desthiltdar bû, ev der weke girtîgeha zarokan dihat bikar anîn, me jî xwest em vê girtîgehê bikin jêdara zanist û edebiyatê û avakirina nifşên nû ji civakê re, lewra me ev der hilbijart”.

**`Bi 75 xwendekaran me dest pê kir`**

Mihemed Osman sîstem û fakolteyên ku hatine vekirin anîn ziman û wiha got: “Di destpêka avakirina peymangehê de 4 beş hatin vekirin, Mamosteya Refê, Bîyeolojî, Bîrkarî, Fziya û Kîmiya hatin vekirin. Hejmara xwendekarên ku me bi wan destpêkiriye 75 xwendekar bûn, her wiha yekemîn derçûn hat derketin ji paymengehê 41 xwendekar hatin derketin, her wiha sala duyemîn jî 28 xwendkar derçûna wan êçbûn, xwendekarên ku piştî du salan xwendinina xwe qedandine û derçûne hemû dibûn mamoste di dibistanan de, sala duyem me beşa ziman û wêjeya kurdî vekir”.

**“Her sal beşên nû tên vekirin”**

Mihemed da xuyakirin ku her sal li gorî pêwîstiyên xwendekaran ew beşên nû vedikin û wiha domand: “ Di sala bûrî de me dît ku pêwîstiya xwendekaran bi beşên cuda hene, bi Desteya Tenduristiyê re Paymangeha Tenduristiyê li herêma Şehbayê hat vekirin, hejamra xwendekarên wê 30 xwendekarin. Di haman demê de îsal 2022 me du beşên din zêde kirin ew jî zimanê îngîlîzî û beşa kompiyoter, hejmara xwendekarên paymangehê niha 180 xwendekarin”.



**`Êrîşên dewleta Tirk a dagirke û ambargo bandorê li peymangehê dike`**

Hevserokê Peymangeha Şehîd Viyan Amara Mihemd Osman bal kişand ser zehmetiyên ku tên kişandin û axaftina xwe wiha qedand: “Rewşa xwndinê ji rewşa herêmê a ku rojane rastî êrîş û topbaran tê ne qute, her wiha ambargoya ji aliyê hikumeta Şamê ve hatiye ferzkirin li ser xwendekar û xwendinê bandor dike, zehmetiyên ku tê kişandin di aliyê kêmbûna alavên xwendinê weke lênûs, pênûs û qirtasiyên ku em beklav dikin ev yek jî sedema wê ne hîştina derbaskirina wê ji herêmê re, di heman demê ji ber navçeya Şêrawa û Til Rifet her dem rastîî topbaranan tên, xwendekar pirî caran nagihînin ezmûnên xwe yên salene”.

**`Peymangeha Şehîd Viyan Amara xeyalên me zindî kirin`**



Xwendekara Peymangeha Şehîd Viyan Amara Zîlan Sîdo girîngiya xwendinê bi zimanê dayîkê di vê pêvajoyê de da xuyakirin û wiha got: “Di pêvajoya koçberiyê de em di her alî de rastî zemetiyên jiyanî hatin, lê a girîng ew bû ku em ji zanist û fêrkirinê qut nebûn, ji bo ku em xwe ji tavahî cîhanê re îsbat bikin divê em dev ji xwendina bi zimanê dayîkê bernedin, vekirina vê peymangehê ji bo me bû wargeha xeyalên me yên pêşerojê”.

**`Parastina zimanê dayîkê erka xwendekaran e`**

Zîlan Sîdo diyar kir ku li hember tavahî cureyên êrîşên dijmin ew ê parastina ziman û zanistê bikin û axaftina xwe wiha qedand: “Berhmên ku vê şoreşê da ye avakirin ji 10 salan ve û gihîştiye roja me ya îro, divê em parastina van destkeftiyan bikin, çawa ku em niha bi saya vê şoreşê bi zimanê Kurdî dixwînin, wê parastina destkeftiyên şoreşê û derbaskirina zimanê dayîkê ji nifşên nû re wê li ser milê me be û armanca me ya yekemîn be”.

# Şewata Sînemaya Amûdê bûyer û dîrokeke bi êş e

Rojbîn Zagros/Amûdê

**62 sal di ser şewata Sînemaya Amûdê re de derbas dibin hê jî hurgiliyên bûyerê di hişê şahid û welatiyên bajêr de ye. Mihemed Emîn Ebduselam ku ew jî di komkujiyê de hazir bû got, hê jî êşa wê rojê weke roja îro di dilê me de ye, lewra nifşek ji paşroja Amûdê hat tinekirin.**

Li Amûdê 13ê Mijdara 1960î, ji bo piştgiriya şoreşa Cezayirê 500 xwendakarên dibistana Xezalî ya seretayî berê xwe dan Sînema Şehrezad. Li wê deverê agirê ku di dîroka Amûdê de deng veda hat pêxistin û şewateke mezin çêbû. Tê de gelek zarokêb bajarê Amûdê bûn hedef. Tevî ku 62 sal di ser komkujiya şewata sînemayê re derbas bûn, hê jî hûrgiliyên wê di hişê welatiyên herêmê de zindî ye. Di encama vê komkujiyê de zêdtirî 280 zarokên navçeyê jiyana xwe ji dest da.

Di wê roja reş de seranserê Amûdê reş girê dabû. Qîrînên dayîkan ezman dihejandin. Lê ew qîrîn ji erdnîgariya




Amûdê derbas nebûn. 62 sal di ser wê êşa giran re derbas dibin. Gelo Ereban, yan jî Cezayira ku 500 zarokên Kurd ji bo piştgiriya wê çûn sînemayê û ji wan 283 firîşte şehîd bûn û yên din jî birîndar bûn, navê Amûdê bihîstine? Derbarê salvegera şewata Sînamaya Amûdê Mihemed Emîn Ebduselam ku ew jî di komkujiiyê de amade bû ji me behsa hurgiliyên wê rojê kir.

**`Me nizanîbû ku bûyerek bi êş li pêşiya me heye`**

Mihemed Emîn Ebduselam (74) yek ji şahidên komkujiyê ye ku wê demê 12 salî bû, ji me re behsa hurguliyên komkujiyê kir û got: “Sala 1960î ez xwendekarê refa şeşan bûm. Ji bo piştgiriya şoreşa Cezayirê berpirsê dibistanê alîkarî ji me xwest û got, emê tev biçin sînamayê. Em tev zarokên kurd bûn. Wê rojê xwendekar tev hatibûn û me tev berê xwe da sînamayê. Lê me nizanîbû ku bûyerek bi êş li pêşiya me heye.”

Mihemed got, Sînema xaniyekî ji axê û bêkursî bû. Her çend zarokan li ser maseyekê rûniştibûn, yên mezin jî li erdê bûn. Herwiha dikeke ji dar û depan hebû. Derdora sînemayê jî tev bi çewalên boyaxkirî hatibû pêçan.

**`Ji nişka ve dengê qîrana zarokan hat`**

Mihemed da zanîn ku piştî derbasî sînamayê bûn bi nîv saetê bûyera şewatê çêbû û axaftina xwe wiha domand: “Ew nîv saet bû fîlm dest pê kiribû, Ji nişka ve dengê qîran hat digotin, agir bi sînemayê ket. Her kes ber bi derî ve çû. Lê derî hatibû girtin, ti kesî nikarî veke. Di hundir de dikanek hebû, min û gelek hevalên xwe di wir de xwe veşart. Bi gurbûna agir re ban hilweşiya. Derî jî hinekî vebû. Hevalekî min baz da xwe xilas kir. Min jî da dûv. Di wê navê de ez ketim. Dest û lingê min bi giranî şewitîn û ji ser hişê xwe çûm. Ji ber şewatê heta du heyvan êşiyam. Ji ber ku agir mezin bû laşê me tev şewitî, heta hestiyê lingê min xuya dikir.”

**`Bûyereke bi êş û zehmet bû`**

Mihemed Emîn bal kişand ser êş û azarên wê rojê û wiha pê da çû: “ 62 sal derbas bûn hê jî êşa wê rojê weke roja îro di dilê me de ye. Mirov nikare wê rojê bîne ziman. Zarokekî bi şewatê were ber mirinê pir zor e. Me bi çavê xwe didît ka çawa agir bi bedena zarokêm hevalên me dikeve. Bûyereke bi êş û zehmet bû. Çiqas me hewl dida em zarokên bi xwe re xilas bikin, Lê mixabin me nikarî, di dawiyê de ban bi ser gelek kesan de hilweşiya û kesên ku di hindir de man bûn şehîdê Sînamayê.”

**`Nifşek ji paşroja Amûdê hat tinekirin`**



Mihemed bi pêmana wê rojê sersaxiyê ji mabatên qurbanan û gelê herêmê re xwest. Herwiha got, nifşek ji paşroja amûdê hat tinekirin. Eger ewqas kes şehîd nebûna wê niha amûdeke din bi qasî amûda niha hebûya. Wê şewatê gelek nirxên me tine kirin. Gelek ji wan zarokan wê niha bijîşk, mamoste û parêzer bûna. Paşroja Amûdê li ber çavê şêniyên wê şewitî. Lê mixabin qedera zarokên Amûdê bû ku bibin qurbanê vê rojê.

Mihemed Emîn Ebduselam di dawiya axaftina xwe de got, Kesî me Kurdan nine, em û hêza xwe ne. Ji bo em parastina xwe bikin û nehêlin careke din bûyereke wiha were serê me, dive em yekîtiya xwe ya neteweyî çêkin.



# Bernameya çalakiyên 25`ê Mijdarê hat ragihandin

Di bin dirûşma “Li hemberî her cure tundiya dewlet û zihniyeta mêr… Jin, Jiyan, Azadî” de Platforma çalakiyên hevpar yên tevger û rêxistinên jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyaniyek da û tê de bernameya çalakiyên xwe yê ji bo 25`ê Mijdarê ragihand.

Navenda Nûçeyan



Daxuyanî li stada Şehîdên 12`ê Adarê hat xwendin. Herwiha di daxuyaniyê de nêzî sed nûnerên sazî, tevger û rêxistinên jinan ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê amade bûn.

Daxuyanî bi zimanên kurdî, erebî û suryanî ji aliyê endama Koordînasyona Kongraya Star Rîhan Loqo, endama Koordînasyona Meclisa Jinan ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Necla Temo û hevseroka Yekitiya Ciwnên Pêşverû yên Suryan Mêriyana Îsa ve, hat xwendin.

Daxuyanî wiha ye:

“Bi boneya 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinan ya Cîhanê, em tevayiya jinên ku beriya 5 hezar sal di dîroka baviksalarî de, ji ber tundiya mêran jiyana xwe ji dest dane, di serî de xwişkên Mîrabal yên ku dema li dijî dîktatoriya faşîst ya li Komara Domînîk rawestiyan bi awayekî hovane hatin qetilkirin, bi bîr tînin. Bi boneya salvegera têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan, em nerazîbûn û redkirina xwe ya pêkanînên tundiyê li ser jinan li her derê û her demê nû û dubare dikin. Di nava 11 salan de û bi destpêkirina şoreşa jinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, jin karîbû xwe birêxistin bikin û refên xwe bikin yek.

Em di platforma çalakiyên hevpar yên tevger û rêxistinên jinan yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, van binpêkirinên li dijî jinan ku weke sûcên şer û yên li dijî mirovahiyê, ku ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve li dijî jinên sivîl û siyasî pêk tên red dikin. Ji bo yekkirina hewldan û enerjiya me û piştgiriya doza me li her deverên cîhanê, emê li hemberî her cure tundî, çewisandin, dagirkerî û qirkirinê asta têkoşîna xwe bilind bikin. Li ser vê yekê em di 12`ê Mijdara 2022’an de bi dirûşmeya “Li hemberî her cure tundiya dewletê û zihniyeta mêr… Jin, Jiyan, Azadî” dest bi çalakiyên xwe dikin.

Li gorî daxuyaniyê, bernameya çalakiyan wiha ye:

-Semînerên taybet li ser girîngiya Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinan ya Cîhanê dê werin dayîn.

-Dîdar û gotûbêj li ser asta herêmî, Rojhilata Navîn û li ser malperên tora civakî bên lidarxistin.

-Bi boneya 25’ê mijdarê dê mîtîngên girseyî bên lidarxistin.

-Tevger û rêxistinên jinan li gorî bernameyên xwe yên taybet çalakiyên cuda li dar dixin.

-Ji 14 heta 17`ê Mijdarê dê li ser asta gund, navçe û bajaran semîner ji civakê re bên dayîn.

-Ji 18 heta 20`ê Mijdarê dê semîner ji mêran re bên dayîn.

-Ji 22 heta 23`ê Mijdarê dê meşên navçeyan û meşên mêran bên lidarxistin.

-24`ê Mijdarê bi rêya Zoom, bi zmanê înglîzî dê panel li ser asta cîhanê bê lidarxistin.

-25`ê Mijdarê dê mîtîngên girseyî li ser asta kantonan, di nav de her sazî, rêxistin bi dirûşm û rengên xwe bên lidarxistin.

# YJA Star: Em ê armanca her sê Şehîdan bi cih bînin

Navenda Nûçeyan

**YJA Star salvegera şehadeta fermandar Peyman Bagok, Agirî Gabar û Çavrê Amed bi minetdarî bi bîr anî û got, soza me ewe ku em ê armanca hevalên xwe yên şehîd bi cih bînin.**

Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA Starê di sêyemîn salvegera şehadeta fermandar Peyman Bagok, Agirî Gabar û Çavrê Amed de daxuyaniyek da.

YJA Star di daxuyaniya xwe de salvegera şehadeta fermandar Peyman Bagok, Agirî Gabar û Çavrê Amed bi minetdarî bi bîr anî û wiha got: “Rêheval me Peyman Bagok di jiyana xwe ya gerîlatiya 28 salan de weke jin bandor kir, rêberî kir, pêş xist û wiha got: “Ew bû şervan û fermandara gelek çalakî û şerên mezin. Di xeta PKK-PAJK’ê de bû nûnerê jiyana fedakar, kesayetek têkoşer û ruhê azad. Ew bû milîtana heqîqî ya felsefeya Rêbertiya me. Di vî warî de bûye mînaka nefsbiçûkî, sadebûn û durustiyê. Yekane çavkaniya wê nirxên azadiyê bû. Ji ber vê yekê bû xwediyê enerjiyeke jiyanê ya bêdawî, evîneke wî ya mezin û tu carî rê neda astengiyan li pêşiya têkoşînê, li hemberî zehmetiyan paşve neçû, bêhêvî nebû.”

YJA Star diyar kir ku rêhevala wan Agirî Gabar ji bo pêşxistina gerîlatiya profesyonel gelek ked da û wiha got: “Hezkirina wê ya ji bo welat, gel û jinan û baweriya wê ya bi Rêber Apo hişt ku hêj zêdetir têbikoşe. Bi hêza ku ji PKK-PAJK’ê girtiye, di zanistî, vîna cewherî û rêxistinbûnê de hêj zêdetir çalaktir bû. Li hemberî kompoloya navneteweyî biryar da ku li ser xeta Zîlan bibe fedaî, di nava rêxistina Hêzên Taybet de cih girt, pêşengiya rêxistina gerîlatiya profesyonel kir û weke perwerdekar roleke girîng lîst.”

YJA Star da zanîn ku hevrêya wan Çavrê Amed di jiyana xwe ya gerîlatiyê de ku bi coşeke mezin dest pê kir, bi lez pêş ket û di temenê xwe yê biçûk de berpirsyarî girt ser milên xwe û wiha domand: “Hevrê Çavrê li herêma Avaşînê beşdarî gelek çalakiyan bû û bi helwesta xwe ya leheng, kesayeta xwe ya bi vîn û bi. Bi qasî ku di sala 2011’an de tevlî nava Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê bû jî, weke ku salên dirêj di nava PKK’ê de be, cewher, hişmendî û gihîştîbûneke ku bi partiyê re tevdigere temsîl kir.”

Fermandariya Biryargeha Navendî ya YJA Starê daxuyaniya xwe wiha



qedand: “Soza me ya ji bo van şehîdên hêja ew e ku em azadiya fizîkî ya Rêberê me ku sedema hebûna me ye misoger bikin, welatê xwe ji dagirkeriyê, gelê xwe ji qirkirinê, jinê ji desthilatdariya mêr rizgar bikin. Em ê ji bo vê yekê têkoşîneke mezin bidin û teqez em ê bi ser bikevin.”

# Xwepêşandanên Rojhilat û Îran`ê di roja 56 an de xurttir didome

Navenda Nûçeyan

**Îranê li hemberî xwepêşanderan kuştin, girtin û işkencekirin zêdetir kiriye.**

Serhildana li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê dewam dike. Duh jî li bajarên Rojhilat û Îranê çalakî li dar ketin û kesên di Xwepêşandanên li Rojhilat û Îranê bênavber dewam dikin û her roj hîn zêdetir xûrttir dibin. Rêjîma çalakiyan de hatine kuştin, hatin bibîranîn. Serhildana li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ya ji bo azadî û li dijî qetilkirina Jîna Emînî duh jî di roja xwe ya 56’an de dewam kir.

**SINE**

Li bajarên Sine, Mehabad, Bokan, Kamyaran û gelek herêmên din ên Rojhilatê Kurdistanê, ciwan û jinan bi çalakiyên cuda nerazîbûnên xwe anîn ziman û çalakî li dar xistin.

**SERDEŞT**

Li bajarokê Serdeşt ji ber kuştina welatiyê bi navê Hêmin Hemze li gundê Bêwranî yê heman bajarokî xwepêşandaneke mezin hate lidarxistin. Cenazeyê Hêmin Hemze bi dirûşmên ‘Şehîd namirin’ spartin axê û piştî merasîmê xwepêşandan hate lidarxistin. Hêzên rejîmê li vir êrişî xwepêşandanê kir û alozî derket.

**XUREMAWA**

Li bajarê Xuremawa yê Loristanê jî cenazeyê welatiyê bi navê Sam Bîranwend spartin axê û li wê derê jî hêzên rejîmê gule li welatiyan reşandin, girseya tev li merasîmê bû dest bi xwepêşandanê kir.

**BELUCISTAN**

Li bajarên Beluçistanê yên Zahîdan, Rask, Wêranşar, Xaş, Pîşin, Serawan û Çabehar xwepêşandan û çalakî hatin lidarxistin. Li gelek bajarên Beluçistanê hêzên rejîmê hewl da bi rêya êrişan dawî li xwepêşandanan bînin.

**TEHRAN**

Li Tehranê jî çileya zarokê 17 salî yê bi navê Îhsan Xan Mihemedî hate lidarxistin û piştî wê jî xwepêşandan hate lidarxistin. Li Tehranê gelek çalakiyên din jî hatin lidarxistin û dijî rejîmê dirûşme hatin qêrîn.

**QÛM**

Li Qumê jî çalakî hatin lidarxistin û dirûşmeya ‘Jin, Jiyan, Azadî’ li ser dîwaran hate nivîsandin. Li çiyayek Tehranê komek çalakvan, ji bo piştgiriya serhildana li Rojhilatê Kurdistan û bajarên din ên Îranê pankarta ku li ser ‘Jin, Jiyan, Azadî’ hatibû nivîsandin bilindkirin.

Duh Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê dabû zanîn ku di nava



55 rojên xwepêşandanan de bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê herî kêm 130 jin û 645 mêr hatine destgîrkirin û herî kêm 67 kes hatine kuştin.

# `Teşwîqkirina ciwanan li ser koçberiyê rêbazê Şerê Taybet e`

Berpirsê Ofîsa Rêxistinî a PartiYa Sûriya Pêşeroj Nedîm Mihemed diyar kir ku dagirkeriya Tirk di kesayeta ciwanan de Şoreşa Rojava dike armanc û got, dagirkerî bi riya teşwîqkirin ciwanan ji koçberiyê re dixwaze Şoreşê têk mbib e.

**Zana Roj/ Şehba**



Ciwan bingeh û makanîzmaya civakê ne, hêza yekemîn a herikîna enerjî û pêşxistinê temsîl dikin û di avakirina civakê de rola sereke a pêşengtiyê ya ciwana ye. Ji ber wê dema ku dijmin dixwaze civakê têk bibe, di serî de ciwanan dike hedef. Li hember tavahî cureyên şerê taybet a ku di asta yekemîn de ciwanan digire hedef, divê ciwan xwedî nêrîn û helwestekî rast teqîn bin, da ku di salosa şerê cîhanî a taybet de neyên xapandin, bi taybet ji bo ciwanên kurd yên ku ji aliyê dijmin de bi her awayî polîtîka helandinê li ser wan tên meşandin, divê di rastiya dijmin de xwe kur bikin û li gorî pêvajoya heyî kesayeta ciwanên pêşeng di xwe de bidin avakirin.

Derbarê planên dijmin yên derxistina ciwanan ji herêmê û armanca wê berpirsê Ofîsa Rêxistinî ya Partiya Sûriya Pêşeroj Nedîm Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Nedîm Mihemed diyar kir ku moderntiya kapîtalîzmê ji bo têkbirina civakan, di serî de ciwan û jinan dike armanc û wiha got: “Tevayiya sîstemên kapatalîzm di guhartin û pêşxistinên ku di cîhanê de tên çêkirin, di asta herî jor de jin û ciwanan dike hedef. Ev sîstem hewil didin zêdetir di hundir ciwanan de siyasetekî li gor berjewendiyên xwe bidin meşandin ku her tim van ciwanan ber bi xwe ve bikşîne. Hêzên desthiltdar dixwazin bi riya Şerê Taybet ciwanan ji cewherê wan dûrbixin û wan ber bi xizmeta berjewendiyên kapîtalîzmê ve bimeşinin.”

**`Ciwan hêza yekemîn ya têkbirina dagirkeriyê ne`**

Nedîm da xuyakirin ku dagîrker ji bo ku karbe planên xwe yên dagîrkeriyê pêk bîne, hewil dide Şoreşê lawaz bike û wiha dewam kir: “Di tavahiya şoreşên ku di Rojhilata Navîn de hatine destpêkirin û bi bin ketine, yek ji sedemên binketinê pişguhkirina rola ciwanan ye. Şoreşa ku bû 10 sal li hemberî dagirkerî û tavahî hêzên mîtînger li ber xwe da ye, Şoreşa Rojava ye, ciwanan li hemberî taknîk û êrîşên ku li ser axa Rojava hatine kirin û hîn jî didomine, bi bîryardarî û qehremanî têkoşîn dikin. Li Rojava bi saya têkoşîna ciwanan heya vê kêliyê dijmin negihîştiye armancên xwe yê dagirkirina hişmendiya civakê.”

**`Dixwazin Şoreşê di kesayeta ciwanan de têk bibin`**

Nedîm dest nîşan kir ku dewleta Tirk a dagirker ji bo têkbirina Şoreşa Rojava li hember ciwanên Kurd polîtîkayên helandinê dide meşandin û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker bi riya êrîşên xwe negihîştiye tu encaman, ji ber vê yekê niha dixwaze bi riya sîxur û MÎT ê ciwanan ji şoreşê dûe bixe û şoreşê têk bibe.Yek ji planên wan ewe ku ciwanên herêmê dev ji axa xwe berdin û berê ciwanan bide dewletên rojava, di van demên dawî de dewleta Tirk a Dagirker vê yekê bi riya Şerê Taybet a ku pir aliyê wê hene, gelek teşwîq dike, di encama wê de jî em dibînin ku gelek ciwanên Kurd tên



xapan din û ji welat derdikevin û dikevin xefka siyaseta dagirkeriyê de”.

**`Divê ciwan neyên xapandin`**

Berpirsê Ofîsa Rêxistinî ya Prtiya Suriya Pêşeroj Nedîm Mihemed banga tavahî ciwanên herêmê kir ku nekevin bin bandora şerê taybet û wiha axaftina xwe wiha qedand: “Di van demên dawî de hat dîtin ku ev siyaseta ku tê meşandin siyaseteke xapandinê ye bi dehan ciwanên me berê xwe dan dewletên rojavayî û di encam de hatin xapandin û piraniya wan bi destê qaçaxçiyan di behran de hatin fetisandin û li çolan hatin kûştin. Em banga tavahî ciwanên herêmê dikin ku ev siyaseta teşwîqkirina terka welat a ku hûn pê tên xapandin, ev yek bi destê dagirkeriyê tê meşandin, ji bo binxistina şoreşa ku ewqas bedel tê de hatine dayîn bin bixe û şoreşa ku bi ciwanan destpêkiriye hilweşîne berê we dide koçberiyê”.

# `Divê hiqûqnasên cîhanê helwesteke xurt li hemberî sûcên dewleta Tirk nîşan bidin`

**Hiqûqnasan destnîşan kirin ku bêdengiya hêzên navneteweyî cesaretê dide dewleta Tirk a dagirker da ku sûcên xwe dewam bikin. Her wiha bang li hiqûqnasên li cîhanê kirin ku li hemberî sûcên dewleta Tirk helwesteke xurt nîşan bidin**

Bêdengiya navneteweyî ya li hember sûcên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û êrişên wê yên kîmyewî yên li hemberî gerîlayên azadiyê li Herêmên Parastinê yên Medyayê dewam dike.

Têkildarî mijarê, hiqûqnas Mutez El Sûdan got: “Tevî ku dewleta Tirk a dagirker qanûn û peymanên navneteweyî bin pê dike, lê hîna rêxistinên navneteweyî nexasim ên hiqûqî bêdeng in. Ev bêdengî dide nîşandan ku we jî şirîkên van êrişan in an jî êrişan bipejirînin. Ji ber vê yekê êdî baweriya bi wan nayê.”

El Sûdan anî ziman ku armanca dewleta Tirk a dagirker ne tenê gerîla ye, lê belê dagirkirina çar parçeyên Kurdistanê ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Dewleta Tirk a dagirker dizane ku gelê Kurd hêz û îradeya xwe ji gerîla digire, her wiha dizane ku têkçûna wê li hember gerîla tê wateya têkçûna wê li hember gelê Kurd e. Ji ber wê jî hewl dide hêza gel têk bibe. Lê mixabin hin aliyên kurdî hene nexasim Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) alîkariya dewleta Tirk a dagirker dike da ku armancên wê bi cih bîne û beşdarî êrişên wê yên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê dibe.”

El Sûdan destnîşan kir ku divê



hiqûqnasên li tevahî cîhanê helwesteke cidî û zelal li hember êrişên dermirovî yên dagirkeriya Tirk bigirin û li hember wê bisekinin.

Di dawiya axaftina xwe de hiqûqnas Mûtez El Sûdan got: “Em nikarin li hember kiryarên dagirkeriya Tirk



bêdeng bin, ji ber wê jî bi navê hiqûqnasên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Dîwana Edaleta Civakî û Dadgeran em banga cezakirina rejîma Tirk dikin. Eger neyê cezakirin dê komkujiyên mezintir li dijî gerîlayên li Herêmên Parastinê yên Medyayê û gelê herêmê pêk bîne.”

Girêdayî heman mijarê, cîgirê hevseroketiya Meclisa Qanûnsaz a Tebqayê hiqûqnas Şadî Îbrahîm îşaret pê kir ku dewleta Tirk hemû qanûn û pîvanên navneteweyî derbas kirin, hemû qanûnên têkildarî rêgezên cîrantiya baş û hurmeta sînor binpê kirin û bi domdarî bi çekên kîmyewî yên qedexekirî êrişî Herêmên Parastinê yên Medyayê dike. Şadî Îbrahîm diyar kir ku ev kiryar li dijî peymanên navneteweyî ne û sûcên şer in.

Îbrahîm bêdengiya hêzên navneteweyî



ya li hember kiryarên hovane yên dewleta Tirk şermezar kir û got: “Ev ne cara yekê ye ku dagirkeriya Tirk Hêzên Parastina Gel bi çekên kîmyewî dike hedef. Hêzên navneteweyî bi bêdengiya xwe nîşan didin ku ew êrişên li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê û şêniyên sivîl bi taybetî dipejirînin.”

Îbrahîm anî ziman ku dewleta Tirk bi van êrişan nikare îradeya gerîlayan lawaz bike û got: “Ev êriş hêz îsrara me ya domandina rêya şehîdan xurtir dike. Em ê tola keç û xortên xwe hilînin.”

Şadî Îbrahîm destnîşan kir ku peymana qedexekirina çekên kîmyewî di sala 1997’an de ket meryetê, lê dewleta Tirk li ber çavê cîhanê çekên kîmyewî bi kar tîne bêyî ku hesab jê were pirsîn.-***ANHA***



## Duh Helebçe Îro jî Avaşîn

**Farûk SAKIK**

Di pêvajoya komkujiya Helebceyê de Sedam ji dewletên Ewrûpa madeyên kimyevî û ji Rûsya yê jî makîneyên mîkserê anî li Iraqê gaza jehrî hilberand. Ev gaz li dijî Kurdan bi kar anî. Cîhan bêdeng ma.

Di salên 1980’yî de Sedam dostekî mezin ê dewletên rojava bû. Gelek pere jê qezenc dikirin û ji bo avakirina laboratuwarên kîmyewî û biyolojîk ekîpman jê re dişandin Iraqê.

Piştî komkujiya Helebceyê 8 zanyarên rojavayî derbasî Helebceyê dibin ku yek ji wan jî Prof. Dr. Heyndrickx bû. Şerê Îran û Iraqê hebû û li hemberî hev çekên kîmyewî bi kar danîn. Ev koma ji pirsporên kîmyasalan pêk dihat li ser daxwaza Îranê li heremê bûn. Ewroj derbasî Helebceyê bûn.

Di sala 1992’yan de serokê heyetê Dr. Heyndrickx raporek amade dike û pêşkêşî dewlet û saziyên Ewrupa dike. Di sala 2005’an de dema ku ez di Roj Tv de dixebitîm li ser Helebceyê li Belçîka li zanîngeha Gentê bi wî re hevpeyvînek çêkir.

Digot; “Piştî ku ez jî Helebceyê vegeriyam bi salan min li ser vê karesetê lêkolîn kir. Min rapora xwe ya der barê rewşa Kurdan de pêşkêşî dezgehên navneteweyî kirin, lê belê kesî di qada navneteweyî de tiştek nekir. Li laboratuwara xwe ya Gentê, min ji Xaça Sor re bikaranîna çekên kîmyewî û biyolojîk îspat kir, min ji wan re nimûneyên analîzkirî pêşkêş kir, lê belê civata navneteweyî tu tişt nekir. Dema min rapora van gazan pêşkêş kir, ji min re gotin; van neweşîne, ji ber ku Sedam wê hêrs bibe û em ê nikaribin pê re aştiyê çêbikin.”

Dewleta Tirk bi awayekî hov çekên kîmyewî, gazên jehrî û bombeyan bi kar tîne. Li Zap, Avaşîn û Metîna sedê caran ev bombe hatine bikaranîn. Her wiha bi dehan gerîla jî şehîd xistin. Wek salên Helebceyê heman gotinên ji bo Sedam dihatin gotin, îroj ji bo Erdogan tên gotin. Erdogan hêrs bibe wê pêşî li pêla koçberan veke.

Doh çawa li Helebceyê bêndeng û sûcdar bûn îro jî li hember gerîlayên Kurdan û Kurdistaniyan ev çek tê bikaranîn dîsa bêdeng in. Dr. Heyndrickx di nav hevpeyvînê de digot; heta Kurd nebin hêz wê bêdengiya Ewrupa dewam bike. Îroj Kurd xwedî hêz in. Kurd wê li bendê nemînin ku Amerîka-Ewrupa werin midaxeleyê cîhek bikin û wê demê wê hesab bipirsîn. Na... Jixwe vaye li Rojhilata Navîn di nava şer de ne. Ji bo Tirkiye bi kar bîne, ji êrişên qirkirina Kurdan û li hember gerîlla bikaranîna çekên kîmyewî re bêdeng dimînin. Ji ber ku di encama bikaranîna van çekên kimyewî de karesetên mezin pêk dihatin, Neteweyên Yekbûyî rêxistinek bi navê ‘Rêxistina Qedexekirina Çekên Kimyawî ( OPCW)’ saz kir. Navenda wê li Holanda li Den Haage. Û di sala1997’an ve ev çek bi peymanek ji aliyê 197 dewletan ve hatine qedexekirin. Ev yek di heman demê de wek sûcekî şer jî hatiye destnîşan kirin. Lê tevî ku sazî heye û peyman hene, Dewleta Tirk li dijî gelê Kurd û gerîlayên wê van bombeyên kîmyewî bi kar tîne.

Yekîtiya Ewrupayê van peymanan bin pê dike û piştgiriyê didin Dewleta Tirk ku çekên kîmyewî bi kar tîne.

Heger ev piştgirî tunebûya wê Erdogan ewqasî rehet tevnegeriya û bikaranîna van çekan bi israr nebûya. Ji bo ku Yekîtiya Ewrupa heta dawî piştgiriyê dide qirkirina Kurdan, Kurd û dostên wan jî li her deverê têkoşînek dane destpêkirin. Divê Kurd li navendên Ewrupa bi dengê xwe doh bi bîra wan bixe û bêdengiya wan a îro bişkîne.



# Bangên tevlêbûna meşa 13`ê Mijdarê zêde dibin

Kesayetên rêveber û fermandarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bang li hemû pêkhate û sazî û rêxistinan kir ku tev li meşa navendî ya ji bo şermezarkirina êrişên kîmyewî yên dagirkeriya Tirk li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê bibin ku dê 13′ê Mijdarê were lidarxistin.



Li ser banga Însiyatîfa Gel a Herêma Cizîrê ya ji bo tevlêbûna meşa navendî ya ku wê 13`ê Mijdarê bi dirûşma “Bi vîna gel û gerîla em ê çekên kîmyewî, dagirkerî û xiyanetê têk bibin” were lidarxistin, fermandar û kesayetên rêveber ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bang li hemû pêkhate, sazî, partiyên siyasî, rêxistin û rewşenbîran kir ku tev li meşê navendî bibin.

Hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîvan Xalid bang li hemû pêkhateyên herêmê kir ku tev li meşê bibin û got: “Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka Şoreşa Rojava ve welatiyên sivîl dike hedef û heman siyasetê li seranserî Kurdistanê dimeşîne, hemû rêbazên hovane û çekên kîmyewî yên ku di qada navneteweyî de qedexe ne li dijî gerîla li Başûrê Kurdistanê bi kar tîne. Bi vê yekê hemû qanûnên navneteweyî û rêgezên mafên mirovan binpê dike.”

Bêrîvan Xalid bêdengiya civata navneteweyî ya li hember bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê dewleta Tirk ve şermezar kir û wiha axivî: “Mixabin ev sûc li ber çavê cîhanê bi tevahî tên pêkanîn, lê civata navneteweyî jî bêdeng e. Di salên dawiyê de dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi çekên qedexekirî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kirin û niha jî heman siyasetê li dijî gerîla li Başûrê Kurdistanê dimeşîne ku li dijî wan çekên kîmyewî bi kar tîne, tevî vê yekê jî dîsa civata navneteweyî bêdeng e. Ev bêdengî hewlesta dewleta Tirk xurtir dike û îsrara wê ya girankirina êrişan zêdetir dike ku hemû sînor derbas kirine. Li ser vî bingehê em bang li gelê xwe yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Kurdistanê û tevahî gelên cîhanê dikin ku li hember van sûcan helwesteke cidî bigirin û bi îsrar, îrade û yekitiya gelan dewleta Tirk a dagirker û sûcên wê şermezar bikin.``

Her wiha, endamê Desteya Hevseroketiya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Aldar Xelîl bang li gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir ku tev li meşa navendî bibin û got: “Gelê me yê hêja, li beramberî bikaranîna çekên kîmyewî û êrişên hovane yên artêşa dagirkeriya Tirk ya ku li ser gelê me û li ser gerîla pêk tê, em bi hev re dakevin meydanan û helwestên xwe diyar bikin. Wek hûn dizanin li beramberî berxwedana gerîla artêşa dagirkeriya Tirk êdî şikest, ji bo ku şikenadina xwe veşêre çekên kîmyewî bi kar tîne. Em jî wekî gelê Kurd û tevahî gelên herêmê, li Kurdistanê û tevahî cîhanê ji vê rojê û vir ve di nava çalakiyan de ye û helwestên xwe didin diyarkirin. Lê di raya giştî ya cîhanî de bêdengiyeke li bere bi çav heye. Ji bo ku em vê bêdengiyê bişkînin, xwedî li gerîlayên xwe yên qehreman û berxwedana wan derkevin em tev bi hev re hewlestên xwe li dijî van kiryaran bidin diyarkirin. Li herêma Cizîrê 13`ê Mijdarê mîtînga mezin pêk tê. Di vê mîtîngê de girînge ku em wê dengiyê bişkînin, em bi hev re xwedî li vê berxwedaniyê derkevin û çekên kîmyewî yên ku di asta navneteweyî de qedexe ne, şermezar bikin. Em tev bi hev re li meydanên azadiyê, medyanên serkeftinê, meydanên ku tê de vîna gerîla û gel bibe yek, hevdû bibînin, li dijî dagirkeriyê, li dijî çekên kîmyewî, li dijî hewldanên tunekirinê em bi hev re bi yek dengî bêjin êdî bes e.”

Her wiha, hevserokê PYD’ê Salih Muslim bang li hemû gelên cîhanê, bi taybetî gelê Kurd ê li Rojavayê Kurdistanê, Ewropa û seranserî cîhanê kir ``Xwedî helwesteke dîrokî bin, li dijî faşîzma Tirk rabin. Em bêjin em komkujiyan din li dijî gelê Kurd di sedsala 21`ê de qebûl nakin. Hêviya me bi gelê me xurt e ku wê tev li çalakiyê bibe û piştgiriyê bide gerîla. Divê dewletên cîhanê jî helwesta xwe biguherîne û bêdengiya xwe bişkîne. Serekftin ji daxwazên gelê me û doza wî re.”

Hevseroka TEV-DEM`ê Rûken Ehmed jî êriş û siyasetên dewleta Tirk a dagirker û bikaranîna çekên kîmyewî li dijî gerîlayan şermezar kir û bang li jin, ciwan, mezin û zarokên herêma Cizîrê kir ku roja 13`ê Mijdarê beşdarî meşa şermezarkirin û teşhîrkirina êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê bibin û got: “Ji bo piştgiriya berxwedana gerîla em dengê xwe bilind bikin.``

Hevserokê TEV-DEM`ê Xerîb Hiso jî diyar kir ku armanca çalakiyê piştgiriyê gerîla û teşhîrkirina sûcên dewleta Tirk a dagirker e û got: “Ji bo gelê me yê berxwedêr ê herêma Cizîrê û tevahî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê em we vedixwînin çalakiya rûmetê ya 13`ê Mijdarê ya li herêma Cizîrê. Em sûcên rojane yên dewleta Tirk a faşîst ên li dijî îradeya gelan û bikaranîna çekên kîmyewî li dijî gerîlayên azadiyê yên li çiyayên Kurdistanê şermezar bikin. Roja 13`ê Mijdarê em serî hildin, dewleta Tirk teşhîr bikin a ku ji ber berxwedana gerîlayên azadiyê derbên giran dixwe, di rojên xwe yên dawî de dijî.”

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hesen Koçer bang li tevahî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir ku beşdarî çalakiya 13`ê Mijdarê bibin, êrişên kîmyewî yên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî gerîlayên li Herêmên Parastinê yên Medyayê û siyasetên qirkirinê yên domdar ên li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî şermezar bikin. Hesen Koçer got: “Li hemberî êrişên Tirkiyê û çekên wê yên kîmyewî em berxwedanê geş bikin. Em bang li tevahî gel bi jin, ciwan û temen mezin û zarokan dikin ku roja 13`ê dakevin qadan, beşdarî çalakiyên ji bo şermezarkirin û teşhîrkirina sûcên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê bibin. Em dengê xwe bilind bikin ku ruxmî kîmyewî em ê li ber xwe bidin û piştgiriyê bidin hêzên xwe.”

Endama Koordînasyona Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rîhan Loqo jî banga tevlêbûna meşa navendî kir û got: “Dewleta Tirk a faşîst çekên kîmyewî li hemberî hêzên gerîla yên ku di sedsala 21`ê de berxwedaneke dîrokî nîşan didin û mirovahiyê diparêzin, bi kar tîne. Li dijî van êrişan em bi rihê Sara û Zîlanan bang li tevahî gel, pêkhate, jinên azad, ciwan, rewşenbîr, nivîskar, sosyalîst û demokratan, mezin, biçûk, dayik, bav û tevahî gelê me yê berxwedêr dikin ku beşdarî meşa rûmetê ya 13`ê Mijdarê ya herêma Cizîrê bibin. Em deyndarên gerîla ne. Erka me ya mirovî ew e ku em li qadên berxwedanê bin û hezkirin û silavên xwe ji wan re bişînin. Em berxwedana wan silav dikin û dagirkerî û çekên kîmyewî şermezar dikin.”

Berdevka Kongra Star a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Remziya Mihemed jî got: “Bi îrade û yekitiya gel û gerîla em ê dagirkerî, xiyanet û çekên kîmyewî bişkînin. Em bang li hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, jin, ciwan û tevahî rêxistinên jinan dikin ku dakevin qada rûmet û azadiyê. Em piştgiriyê bidin berxwedana gerîla û bikaranîna çekên kîmyewî û bêdengiya navneteweyî şermezar bikin.”-***ANHA***

FENER



## Mezinên Xwe Nîn Bin, Bila Li Mezinekî Xwe Bigere!

**Idrîs HENAN**

Çar sal di ser derbiderbûna gelê Efrînê re derbas dibin û li tonela sala pêncemîn a dagirkirin Efrînê, demjimêr û roj tên hesibandin. Şêniyên Efrînê ku serê xwe ji dagirkeriya Tirk, teknîk û çeteyên wê re netewandin, îroj li Şehbayê li nav kampan û kavilan bi cih bûne. Li ber Serma, seqem, germahî û tunebûnê xwe ragirtine, dîsa jî qebûl nakin serî ji mêtingeran re biçemînin. Çendîn jimar û rêjeya akîncîtiya hatiye koçberkirin mezin be, çendîn asta dizî û talaniyê mezin be, çendîn kuştin, revandin û hebiskirin pir be, çendîn zilm, zordarî û destdirêjî kûr be, dîsa jî dijminê êrişkar nikare bibêje ku bi ser ketiye. Serketina li dijî Efrîniyan jê re bûye xewn û xeyal ku her şeva derbas dibe, temenê dagirkeriyê kurtir dike.

Çar sal in û koçberên Efrînê, li pey hev rastî êrişên curbecur tên. Hemû aliyên tiliya wan di dagirkirina Efînê de hebû, îroj bi hev re hewl didin wê konseptê dewam bikin û vîna azadiyê di wî gelî de bikujin. Rojane zengilên cengê lê didin û hewl didin tirsê biçînin. Balansa hêzê li ser bingeheke çewsîner ava dikin û dixwazin bi tunekirina vîna vegerê re, di kesayeta koçberên Efrînê de, vîna Bakur û Rojhilatî Sûriyê têk bibin. Mereq û hesreta wan jî ew e.

Rejîma Sûriyê ku ji destpêka aloziyê û vir de li dergehên xilasiyê digere, tevî hemû “destketiyên” li beramberî hêza bi navê “opzisyon” bi dest xistine jî, lê bi temamî di birêvebirina aloziya welêt de bi bin ketiye. Serketina xapînok, ku rejîmê xwe pê daye îqnakirin ku dikare bi vî rengî li ser dika vî welatî serwer be, tabloyek çewt derxistiye holê. Rejîma desthilatdar a Baas, bi van rêbazên fikirînên neteweperest ên ti têkîliya xwe bi alfabeya siyaseta exlaqî re nînin, her şer, dek û dolab, dorpêç, ambargo û birçîkirin tercîh kiriye û xwe li dûrî çareseriyên siyasî giritye. Wer lê hatiye ku vînên radestbûyî li deverên dîtir ên Sûriyê teslîm girtin, ji wê ye jî, dê li Şehba yan li Şêx Meqsûd û Eşrefiyê jî vîna gelên berxwedêr teslîm bigire.

Ev cureya rejîman xwedî hafîzeyên fena masiyan e. Dîroka bi destê wan neyê nivîsandin, wane û dersan jê nagirin. Lew re; zû ji bîr kiriye dema parêzgeha Helebê radestî çeteyên Tirkiyê Alqayîde dikir, herdu taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê li ber xwe didan. Dema tevahiya gundewarên bakur rojavayê Helebê radestî Al Nusra û DAIŞ dikir û Efrîn di nav lepên wan guran de dihişt, gelê Efrînê ji Qestel Cindo heya girên Cindirêsê û Şêrawa li ber xwe dida û derbên giran li wan çeteyan dida.

Îroj Hikumeta Şamê li Şehbayê û Helebê siyasetek wisa koordînekirî bi daxwazên dagirkeriya Tirk re dimeşîne û sûcên mirovî dike. Tişta ku Tirkiyê bi şer, teknîk û teknolojiya NATO`yê nikaribû li Efrînê pêk bîne, bê guman rejîmeke jihalketî, nikare bi van rêbazên tixyayî pêk bîne. Dara ku li ser goleke xwîna pakrewanan mezin bûye, ti bayek nikare pîqinên wê bihejîne û ne jî pelên wî biweşîne. Pêwîste rejîma Baas vê yekê baş zanibe û li şûna xesibkarê axa Sûriyê, berê xwe bide gelên Sûriyê. Nikare bi van şêwaz û rêbazên dubarekirî, vîna berxwedêrên Efrînê li Şehbayê têk bibe. Eger mezinên ku aqilan bidinê nîn bin, bila li mezinekî ji xwe re bigere ku hiş bîne serî.